Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 939 06-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني
http://www.ronahi.net

# Li dijî talana goran

**Li dijî talankirina goran ya bi destê dagîrkerên Ewropî, Çînçayên sedsala 16´an yên li Amerîka Latîn stûna pişta miriyên xwe bi qamîşan bi hev ve kirine.**

Tişta ku Ewropiyan sedsala 16'an bi xwe re birî Amerîkayê ne tenê dagirkerî, nexweşî û mirin bû. Tişta wan kir, nexasim jî bêhediya talankeriya wan tesîreke xirabtir jî li ser civakên deverê yên xwecihî kir. Cenazeyên miriyên miletê Çînça yê li başûrê Perûya îro yên qederê 500 salî jî vê yekê nîşan didin. Bifikirin, hestûyên miriyan tên dîtin û em dibînin ku qamîşek, darikek di darê wan ê piştê re hatiye birin. Komeke lêkolerên arkeolojiyê, ne yek û ne didu, tam 192 bermahiyên cenazeyên wê demê yên wisa dîtine. Serê pêşî li rîtuline elaqedarî veşartina miriyan fikirîbin jî, rastiyê xwe zû bi wan daye hîskirin: Ev tevdîrek bû.

Lê tevdîra çi? Xweş tê zanîn ku Ewrûpiyên hingê Emerîka Latîn dagir kirin, her tişta miletên xwecihî talan kir. Di nava her tiştî de gor û cenaze jî hebûn. Wan tekstîlên -weke kefen- ku cenaze bi hev ve digirtin, diqetandin û li zêr, zîv û tiştên bi qîmet digeriyan. Piştre jî ew cenaze ji hev de diket, ji ber ku tekstîlên ew li wan pêçayî êdî ew bi hev ve nedigirtin. Xelkê xwecihî jî weke tevdîra parastina yekerebûna van cenazeyan, qamîşek, darikek dixist stûna piştê miriyên ku kiras û kefenên wan ji bo talanê hatine parçekirin, da ku hestûyên ji derbahevketî dîsa yekere bin.

Yanî esas bi talankirina miriyan, wan aramiya zindiyan a piştî şînê jî talan dikir.

Bi qamîş û darikan yekparebûn parastin

Ji Zanîngeha East Anglia, Dr. Jacob Bongers encamên lêkolînê di kovara Antiquity de weşandin. Ew dibêje, "Fikr ew e ku gava ku Ewrûpiyan talan dikir, lazim bû ew li bin van paçên li ser van laşan binihêrin, û bi vî rengî ew van paçan diqetînin, ji laşan dikin û zêr û zîv derdixin û cenaze jî ji hev de dikevin."

Piştre jî li gorî wî xelkê Çînça tên heman cihî: "Gava cenazeyên ji hev de ketî dibînin, hewl didin wan bi hev ve bikin."

Gava ku Ewrûpiyan, xasma dagirkerên li ser navê Meliktiya Spanyayê tên deverê, serjimara Çînçayan herî kêm 30 hezar e. Li gorî dagirkerên Spanî behsa wan dikin, ew xweşhal in û bi bazirganiya xwe ya bi keştiyan jî navdar bûne.

Ne yek lê 192

Lêkoleran pêşî sala 2013´an li goristana li Geliyê Çînça ev cenazeyên bi qamîşekî, darikekî bi hev ve hatine kirin dîtine. Meliktiya Çînça jî bi xurtî darîçav bûbû li vî geliyî. Împeretoriya Înkayan paşê di sedsala 15´an de wê welatê wan li Împeretoriya xwe zêde bikira.

Axir, Bongers û hevalên wî pêşî difikirin ku talankeran wiha li cenazeyan kiribe. Lê piştre gava ew 192 cenazeyên bi heman rengî hestûyên stûna piştê bi hev ve kirî dibînin, li ser vê serê xwe bêhtir diêşînin. Heta ku têkiliyekê di navbera wan û paç û kefenên qetandî de datînin. Hingê jî bi ser ve dibin ku mesele ew e ku xelkê piştî talanê hewldaye yekparebûna cenazeyên miriyên xwe biparêze û ew jî tevdîra wan bûye. Ev cenaze hemû li goristanên mezin ên bi navê çulpa hatine dîtin. Cenazeyên mezinan û ciwanan bi vî rengî hatine parastin.

Mirin ji bo wan ne dawî bû

Lêkolînên bi radyokarbonê jî piştrast dikin ku hestû yên kesên di navbera 1520 û 1550´î de mirî ne û qamîş û darikên ji bo bi hev ve kirina wan jî ji 1550´î heta 1590´î hatine berhevkirin. Ev jî wê teza talanê û piştî talanê bihevvekirina stûna pişta cenaze piştrast dike. Lewma ev qamîş û darik teqrîben ji wê demê ne ku Ewrûpiyên gornebaş û talanker xwe gihandine Çînçayê.

Wekî din hestûyên stûna piştê gelek caran ne li gorî rêza anatomîk e. Yanî gava ew li qamîşyan jî darik hatine rêzkirin, ew ji mîj ji hev de ketine.

Destwerdana xelkê xwecihî piştî talankirina gorên miriyên wan bûye.

Jiyan li nava gelek civakan û her wiha li cem Çînçayan bi mirinê dawî nebûye. Ev parastina cenaze jî miameleya wan bi mirinê re nîşan dide: Mirin ne dawî ye.

Çawa ku Bongers dibêje, Kolonyalîzma Ewrûpî xelkê xwecihî ji wê yekê dûr nagire ku miameleya xwe bi mirinê re dewam bike. Lê belê ev tevdîr bi serê xwe jî nîşan dide ka tesîreke çiqasî trawmatîk li civakê hemûyî kiriye. Fikra ku ev parçeyek ji rîtuelên Çiyayên Andê yên miriyan be hîna ji beriya destwerdana dagirkeriya Spanî, bi wê yekê lawaz dibe ku ev cenazeyên hanê hemû jî paçên wan hatine qetandin û nîşanên destwerdaneke ji derve nîşan didin.

***Ozgûr Polîtîka***








# Telefonên jîr

**Berî derketina telefonên jîr, jiyana mirovan ne ev bû. Aliyên erênî yên vê teknolojiyê her çiqas pir bin jî têra xwe aliyên wê yên neyînî jî hene.**




Berî 95 salan di kovara Collier de dinivîsî, "Heke kablo bi awayekî serketî werin bicihkirin, siberojê cîhan dê bibe mejiyekî dêwane. Ev yek jî parçe û rîtmên temamiyekê ne. Mesafe dê nebin problem ji bo mirov têkiliyê bi hev re deynin. Ne tene ev jî bi alîkariya televîzyonê û telefonan mirov dê karibin hev pirr baş bibihîzin û hev bibînin. Her wiha sazûmaniya wan amûran jî dê ji telefonên heyî hêsantir be. Her mirovek dê karibe vê amûrê bike berîka xwe."

Ev pêşbînî helbet yên Nîkola Tesla ne. Baş e ev fikr ên Tesla bûn lê belê kesê ku telefonên bi aqil bi pêşxist kî bû? Destpêka telefonên biaqil ne bi Apple ye. Beriya telefonên wekî BlackBerryê jî telefonên ku mail dişandin, hebûn.

Ji aliyê teknîkî ve telefona cara yekem wekî telefona biaqil dihate binavkirin, têra xwe mezin bû. Di sala 1994'an de telefona IBM Simon Personal Communicator hate hilberandin. Bihayê wê hezar û sed dolar bû. Helbet li gorî wê demê ev pereyekî pirr zêde bû peydakirina wan ne hêsan bû. IBM'ê di salên 1970'î de li telefoneke wekî kompûteran fikirîbû lê belê heta sala 1992'yan ev telefon nehate hilberandin û wekî projeyekê ma.

Ceribandina telefona Sîmonê ji bilî lêgerînê, mail û faks jî dişandin. Heta ekrana wê jî wekî telefonên roja me bi şemitandina tiliyan bû. Telefona Sîmon, li gorî heyama xwe pirr serketî bû, lê belê ji bo bikarhêneran pirr biha bû û hemû beşên civakê nedikarîn wê telefonê bi dest bixin.

Bihayê telefonê erzankirin û 50 hezar firotin, paşê dev ji hilberandina telefonê berdan. Sedem ne bihayê telefonê bû. Bikarhênerên telefonê ji teknolojiyeke ew qasî pêşketî re ne amade bûn.

Di sala 2007'an de Jobs li ser dikê telefona ku ji aliyê sazûmaniyê ve dişibe kompûteran, da nasandin. Ew telefon jî telefona biaqil ya iPhone bû. Ji wê rojê ve kêm zêde telefonên biaqil, li gorî sazûmaniya wê telefonê tên çêkirin. Lê belê her telefoneke ku nû tê çêkirin, taybetiyeke cuda lê tê barkirin. Bi vî awayî bipêşketin zêdetir dibe.

***Ozgûr Polîtîka***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Arkeolojî (Fransî) | Zanista kolanê, şûnwarnasî, vekolîna dîrokê bi riya tiştên ji serdemên berê ve di binê erdê de mayîn û pişt re hatîn dîtin. |
| Arkeolog (Fransî) | Pisporên arkeolojiyê, kesên ku karê wan arkeolojî ye |
| Baregeh | Biryargeh, bingeh, navend, merkez, qerargeh, meqer, mekan, cî. Bi giranî di qada leşkerî de bi kar tê. |
| Jîngeh | 1. Cihê zindî lê dijîn. 2. Derdor, hawîrdor. Bi taybetî xwezaya li derdora mirovan |
| Materyal. (Fransî) | 1. Tişta ji bo çêkirina tişteke din, tişta ku tişteke din jê tê çêkirin. Amûr, alav, pêdivî: Qumaş materyalê cilan e. Pirtûk materyalên dersan in. 2. Çi nivîskî, çi devkî, çi bidîmen her belgeya hatî qeydkirin. |
| Rêl | Daristan, dehl, dehlûdir, xerz, bîşe |
| Sansûr (Fransî) | 1. Karê venêrîna rêveberiyê ji bo her rengê waşanê, berhemên sînema û tiyatroyê, venêrîna hişk: Qaşo ragihandin azad bû, sansûr rabûbû. 2. Girêdana her rengê weşanê, berhemên sînema û tiyatroyê bi destûrê ve, venêrîna hişk. |
| Têgeh | Peyvên ku bi taybetî hin wate li wan hatine barkirin. Waje, wate, têgîn, term |
| Xweza | Xurist, surişt, tebîet, natûr |
| Xwezayî | 1. Surişţî, xuristî, tebîî, natûrel. Tişta têkildarî xwezayê. 2. Tiştên ne berhemên pîşesaziyê. 3. Asayî, normal. 4. Tişta neguhertî |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | C | ■ | A | L | A | ■ | T | A | ■ |
| 2 | A | A | ■ | A | W | A | ■ | R | A |
| 3 | ■ | Ş | Î | V | ■ | B | E | G | ■ |
| 4 | S | ■ | S | A | K | O | ■ | O | F |
| 5 | Î | R | O | ■ | A | R | Î | ■ | E |
| 6 | ■ | E | T | Ê | ■ | Î | D | I | R |
| 7 | Î | Ş | ■ | D | A | N | ■ | R | ■ |
| 8 | S | ■ | T | Î | ■ | A | L | A | L |
| 9 | A | J | O | ■ | A | S | A | ■ | I |

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 2 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 4 | | | | ■ | | | ■ | | |
| 5 | ■ | | | | | | | ■ | |
| 6 | | | ■ | | ■ | | | | |
| 7 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 9 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |

**ÇEP-RAST**

1. Îşaret, şop... Encam, netîce
2. Xwarinên ji şîran
3. Cureyekî xwînê... Ji bo tiştê ku navê wan nayê bîra mirov an jî mirov naxwaze bi nav bike (Bi taybetî li herêma Amedê tê gotin)
4. Di Bektaşîtî û Mewlewîtiyê de birayê terîqetê... Baneşaneke gazîkirinê... Jan
5. Keça apê mirov
6. Daçekek ku wateyê xurt dike... Dijbera çepê
7. Beyreq, sembola welatan... Yezdanekî misrî
8. Cînava gerok... Kurdistan li ser kîjan parzemînê ye
9. Notayek... Kar û xebat

**JOR-JÊR**

1. Kurteya elementa Aktînyûmê... Daçekek
2. Celebek qaxizê nivîsê ku stûr e û rengê wî dişibe rengê kayê
3. Cejn, eyd... Tûj... Cure, celeb
4. (Rustemê ...) Destaneke me... Cureyek segê nêçîrê
5. Cînava pirhejmariyê ya xwerû
6. Postê gurandî... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê
7. Kevok... Gerstêrkek
8. Pirsek di rewşa tewandî de... Hewaya bêewr
9. Notayek... Kesê ku libat û tevgerên wî ji adet der in... Cihê heranê

# Şefê DAIŞ'ê yê di binê parastina Tirkiyê de hat kuştin

Piştî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên 1'ê Sibatê, şefê DAIŞ'ê Ebû Îbrahîm El Haşimî El Qureyşî li nêzî sînorê Tirkiyê di operasyoke hêzên taybet yên Amerîka de hat kuştin. *R-3*

Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 939 06-Sibat- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Şêniyên Hesekê 23 Şehîdên Oparasyona `Gurzê Gelan` spartin axê

4ê Sibatê saet 10:00`an bi hezaran şêniyên bajarê Hesekê cenazeyên 23 şehîdên oparasyona `Gurzên Gelan` li goristana Şehîd Dijwar ya li gundê Dawidiyê spartin axê. *R-3*

# `DEWLETÊN KOALÎSYONÊ, RÛSYA Û IRAQ HEVPARÊN ÊRIŞAN ÎN`

**KCK:**

- Têkoşîna 4 parçeyên Kurdistanê şefên faşîzmê dîn û har kirin
- PDK amûrê dewleta tirkî yê propagandayê ye.
- Êrişa li ser QSD'ê êrişa li ser gel e
- Bêdengî wê wek mînaka herî zelal ya bêexlaqiya siyasî bikeve dîrokê
- Em ji van hêzan dipirsin; gelo hûn alîgirên yên ku li dijî DAIŞ'ê şer dikin in, yan li gel DAIŞ'ê û hevalbendên wê ne?
- Divê gelê cîhanê van kiryarên dijmirovî qebûl neke

## KCK: Dewletên li dijî DAIŞ'ê koalisyon ava kirîn, herwiha Rûsya û Iraq hevparên êrişan in

**KCK'ê diyar kir ku welatên li dijî DAIŞ'ê koalisyon ava kirîn, Rûsya û Iraq hevparên van êriş û kuştinan in û bang li gelên cîhanê kir ku li hemberî van kiryarên qirkirina gelan, bibin xwedîhelwest.** *R-4*

## Nûra, di binê balafirên keşfê de ji bo parastina zarokên xwe stargehek çêkir



Nûra Şêxmûs Ehmed ya ji gundê Bab El-Xêr ya Til Temir di binê firîna balafirên dewleta tirkî ya dagîrker de ji bo parastina zarokên xwe stargehek çêkir. *R-6*

## Êşa xiyanetê ji êrişê girantir e




Yûsif Kara: Berî êrişa ser wargehê, kehrebeya wargehê hat qutkirin, PDK´ê riya Hewlêrê vekir û bangên alîkariyê hatin kirin. Ev hemû bi plan bûn, hemû girêdayî êrişa ser wargehê bûn, xwestin bi yek carê wargehê vala bikin. *R-5*

## Komploya 15ê Sibatê, bi tecrîd û êrişên qirkirinê didome



Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Herêma Cizîrê, Komploya 15`ê Sibatê şermezar kir û diyar kir ku armanc û planên kompoya navneteweyî hatine qelskirin, lêbelê bi tevayî nehatine pûçkirin û komplo dewam dike. *R-5*

## 'Riya çareseriyê Îmralî ye'



Besê Hozat: Eger tê xwastin ku demokrasî, edalet û hiqûq bê Tirkiyê, divê pergala işkence û tecrîdê ya Îmralî, wek sûcê mirovayiyê were dîtin û were mehkûmkirin. *R-2*

## Ji bo zarok û mamosteyan alîkariya pirtûkan

Hevseroka PEN`a Kurdî, Eslîxan Yildirim, ji bo zarokên ku wê dersa kurdî li dibistanan li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê hilbijêrin, pirtûkên kurdî şandin. *R-7*




## Rêveberiya Sewalkariyê barê sewalvanan sivik dike



Ji bo çareserkirina pirsgirêka sewalvanan, herwiha peydekirina êm ji sewalan re, Rêveberiya Sewalkariyê ya Kantona Qamişlo madeya Nexalê li Sewalvanan belav dike. *R-6*

# 'Riya çareseriyê Îmralî ye'

**Besê Hozat: Eger tê xwastin ku demokrasî, edalet û hiqûq bê Tirkiyeyê, divê pergala işkence û tecrîdê ya Îmralî, wek sûcê li dijî mirovayiyê were dîtin û were mehkûmkirin.**

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat bûyerên girîng ên di rojevê de ji ANF´ê re nirxandin.

**''Hêzên navneteweyî yekser piştgiriyê didin polîtîkaya qirkirinê'**

Besê Hozat got, Rêber Apo muxatebê çareseriyê yê doza Kurdan e. Di çareseriya doza Kurdan de, muzakerevanê esasî ye. Bi tinehesibandina Rêber Apo ti çareserî pêk nayê. Rêya çareseriyê di Îmraliyê re derbas dibe.

Di beşa 1´ê ya roportajê de Besê Hozat, li ser komploya navnetweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan got, "Em dikevin sala 24'emîn a komploya navneteweyî. Ez hêzên komploger ên navneteweyî ku DYE pêşengiya wan dike, bi nefret şermezar dikim. DYE, Ingilîstan, Îsraîlê pêşengiya komployê kirine, li hemberî gelê Kurd û mirovayetiyê sûcê herî mezin ê dîrokê kirine. Bi komploya li dijî Rêber Apo re yekser tevlî qirkirina Kurdan bûn. Yanî, hêzên navneteweyî yekser piştgiriyê didin polîtîkaya qirkirinê ya dewleta Tirk. Komploya navneteweyî ya 15'ê Sibatê, pîlaneke nû ya Şark Islahatê ye. Di şexsê Rêber Apo de komplo li dijî gelê Kurd hatiye kirin.

Helwesta Rêber Apo, şehîdên fedaî yên 'Hûn nikarin roja me tarî bikin'û gelê me yê berxwedêr, ji xeynî dîlgirtina fizîkî ya Rêber Apo, komplo pûç kir."

**'Têkoşîneke gerdûnî ye'**

Hozat li ser kampanyaya ji bo azadiya fizîkî ya Ocalan jî wiha got, "Fikrê Rêber Apo di nav jin û gelan de, heyecaneke mezin, hêvî, têkoşîn û baweriya serkeftinê pêk anî. Di asta global de xwedî li Rêber Apo hate derketin. A niha têkoşîna pêkanîna azadiya fizîkî ya Rêber Apo, bûye têkoşîneke gerdûnî.

Pergala tecrîd û êşkenceyê ya 23 salan, pergaleke komployê ye. Komplo ji bo ku di şexsê Rêber Apo de tevgera azadiyê tesfiye bike û qirkirina Kurdan pêk bîne, 23 sal in wekî pergala tecrîd û êşkenceyê didome. Dîktatorê faşîst Erdogan, li Îmraliyê tecrîd û zexteke gelekî giran a nemerdane dike û li ser navê Rêber Apo jî diaxive. Ev yek li gel pergala tecrîdê, îflasa siyaseta wî nîşan dide. Xwe diavêje ber hêz û bandora Rêber Apo û dixwaze bi vî şêvazî desthilatdariya xwe ya ketiye pêvajoya hilweşandinê, li ser pêyan bigre. Ji aliyekî ve li ser Rêber Apo tecrîdeke mutleq dide meşandin û ji aliyê din ve jî li ser navê Rêber Apo her roj daxuyaniyan dide, bê guman ev tişt jî rûreşiya dîktatorê faşîst nîşan dide. Jixwe HDP'ê yekser bersiva wî daye. Diyar kirine ku bila deriyê Îmraliyê were vekirin û fikra Îmraliyê çi ye bila her kes lê guhdarî bike. HDP û gelê Kurd dizanin ka Erdogan dixwaze çi bike. Ji ber vê jî hesabê wê ji roja pêşîn ve hatiye pûçkirin."

**'CHP heta ku rast nêzî doza Kurdan nebe wê nikaribe siyaseteke baş bike'**

Li ser daxuyaniyên CHP´ê yên elaqedarî pirsgirêka Kurd jî Besê Hozat wiha nirxand: "CHP heta ku rast nêzî doza Kurdan nebe û bala xwe nede serokên siyasî yên Kurdan, wê nikaribe siyaseteke baş bike. CHP heta ku Rêber Apo wekî mûxatebatê sereke yê Kurdan nebîne û qebûl neke, Kurd wê li wan helal nekin. Dema ku CHP pergala tecrîda faşîst a derveyî hiqûq û qanûnê ya li Îmraliyê meşrû bibîne, wê nikaribe ji Kurdan û civaka Tirkiyeyê re qala hiqûq û edaletê bike. Herwiha CHP hevdîtina bi Rêber Apo re sûc bibîne, wê nikaribe rêya demokrasiyê ji Amedê bide derbaskirin. Rêya ku ji Îmraliyê derbas nebe, wê ji Amedê jî derbas nebe. Rêya demokrasiyê ji Îmraliyê derbas dibe. Rêya edaletê ji Îmraliyê derbas dibe. Rêya hiqûqê ji Îmraliyê derbas dibe. Heke demokrasî, edalet û hiqûq wê were Tirkiyeyê, divê pergala êşkence û tecrîdê ya Îmraliyê, wekî sûcê mirovayetiyê were dîtin û were mehkûmkirin. Kesên ku ev pergal ava kirine û dewam kirine, divê werin dadgehkirin.

Rêber Apo di çareseriya doza Kurdan de muxatebê çareseriyê ye. Di çareseriya doza Kurdan de muzakerevanê esasî ye. Bi tunehesibandina Rêber Apo ti çareserî pêk nayê. Rêya çareseriyê di Îmraliyê derbas dibe. Pêvajoya çareseriyê ya ku Rêber Apo aktorê sereke ye, di meclîsa Tirkan de dikare were nîqaşkirin."

# `Emê planên we bi têkoşînê pûç bikin`

**Dilîn Ehmed-Ronahî**

**Li dijî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, şêniyên Qamişlo gotin, divê hêzên navdewletî bêdeng nemînin û rê li ber van êrişan bigrin.**

Ev demeke dirêj e herêma bakur û rojhilatê Sûriyê di binê gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker de ye. Dewleta tirkî bi êrişên xwe dixwaze ewleyî û aramiya herêmê ya di binê kontrola Rêveberiya Xweswer de têk bibe. Li hemeberî van êrişan, gelê herêmê bi tevayiya pêkhateyên xwe, li ber xwe didin û van gef û êrişan bi çalakiyên cuda şermezar dikin.

**`Erdogan bi êrişên ser bajarê me tola çeteyên xwe radike`**

Derheqê vê mijarê de welatiya bi navê Heya Hecî ji rojnameya me re wiha axivî:



"Çima hêzên navdewletî li dijî sûcên ku dewleta tirkî di heqê gelê Kurd de dike, bêdeng in. Li ser çi bingehî Erogan êrişî me dike, yê sûcdar û divê bê darizandin ew bixwe ye. Lewra wî xaka me dagîr kiriye. Em bi saya xwîna keç û xurtên xwe li ser xaka xwe dijîn. Her ku çeteyên DAIŞ`ê di şerê li hemberî şervanên me de têk diçin, dewleta tirkî bi êrişan xwe yên ser herêmên me tola wan radike. Mînaka herî berbiçav jî dema DAIŞ di şerê li girtîgeha Sînaa ya bajarê Hesekê de têk çû, dewleta tirkî bajarê Dêrik, Mexmûr, Şingal û gundewarê Amûdê bi belafirên şer bombebaran kirin."

Heya Hecî di dawiya axaftina xwe de got, di van rojên hesas de, ya herî girîng û pêwîst berxwedane gel e, lewra em di rojên dîrokî de derbas dibin. Divê gelê me bi tevayiya pêkhateyên xwe derfetê nede ti kesî ku yekîtî û biratiyê têk bibe.



**`Bila cîhan çavê xwe ji sûc û êrişên dewleta tirkş re negire`**

Li ser heman mijarê Ezîza Elî jî diyar kir ku divê çeteyên DAIŞ`ê werin darizandin. Ezîza axaftina xwe wiha domand: "Hebûna DAIŞ`ê li ser tevayyya cîhanê xeter e. Banga me ji hêzên navdewletî re ew e ku, van çeteyan darizînin. Rojane keç û xortên me bi destê van çeteyên hov tên şehîdxistin. Sedem çi ye ku dewletên têkildar nayên welatiyên xwe yên çete, nabin?"

Ezîza Elî axaftina xwe wiha qedand: "Gelên herêmê bi tevayiya pêkhateyên xwe Kurd, Ereb, Suryan, Erman ji bo jiyaneke azad, gelek berdêlên giran dane. Ji ber wê em bi ti awayî êrişên dagîrkeriyê qebûl nakin û bi ruhê şervanên xwe emê li ber xwe bidin. Bila cîhan çavê xwe ji sûc û êrişîn dewleta tirkî re negire. Lewra tev jî armanca dewleta tirkî ya faşîst dizanin. Ji bo tevayiya rêxistinên mafên mirovan û saziyên demokratîk banga me ew e ku, bêdeng nemînin, lewra Erdogan dev ji siyaseta xwe ya hovane bernade."



## Ev ne gotegot e rastî ye

**Jiyan Tekoşîn**



Di roja meya îro de sîstema kapîtalîst jiyan xistiya nava zîndanekê û mirov tê de fetisandine. Ji her alî ve civak tê tepisandin. Xweza û bi xwezayê re zindî di nava qeyranekê de ne. Li rex wê dema mirov berê xwe dide çiyayên Kurdistanê, dibîne ku jiyaneke alternatîf, wekî keştiya Nûh li benda xilaskirina mirovan e. Ev jiyan di nav xwe de bawerî û hûviyên azadiyê dihewîne.

Di roja me ya îro dewletên hegemon li hemberî korona û nexweşiyên kapîtalîzmê nikarin, yan jî naxwazin mirovan biparêzin. Dewlet-Netewe bi planên xwe yên ku mirovayî ji holê rake, her kêlî nexweşiyan diafirîne û ti kes nabêje sedemên van çi ne? Pergala desthilatdar ewqas mirovan kor dike. Pergala civakê wekî ku dixwaze plan dike; sosyalîteya civakê, hebûna xwezayê ji holê radike û ezeziyê dide pêş. Wê demê ji bo jiyanê çi ma? Tam di vê xalê de gotina Rêber Apo ya 'cenawirê di nava me de ti caran evqas mezin nebûye' tê bîra mirov.

Kesan ji bo berjewendiyên maddî tiştekî ayidê xwezayê nehiştine. Ji birçiya di her kêliyê de çiqas zindî dimirin û xweza çiqas talan dibe? Her roj li her welatî jin tên kuştin. Ya jiyan afirandî û civak ava kirî tê perçiqandin. Ev bi zanebûn û bi destê pergala ku hişmendiya desthilatiyê mêr daye peş tê kirin. Ev qirêjî di her qada jiyanê de tê dîtin. Ji ber wê Reber Apo dibêje; 'li şûna ku ez di nava qirêja kapîtalîzmê de bijîm ez li vir azad im. Hûn destpêkê xwe azad bikin.'

Jiyana bi keda Rêber Apo û hezar nirxên ku berdêl daye hatî avakirin, ji bo tevayiya mirovayiyê jiyaneke azad û alternatif e. Em berê xwe bidin çiyayên Kurdistnê; jiyaneke bi xezayê re heye. Ji bo azadiya jinan têkoşîn kirin, ji bo tevayiya gelên bindest şer kirin. Ango ji bo jiyaneke xweş, azad û aram şervanên azadîyê her kêliyê li ber xwe didin. Ew ciyên azad mirovan dikşînin nava xwe. Lewra armanc avakirina jiyaneke demokratîk, azad, wekhev û ekolojîk e. Ev ne xeyal e, mînak şoreşa Rojava… Bi projeya Rêber Apo danî pêşiya me 'xweseriya demokratîk' civak tev bi rengên xwe jiyana xwe bi rêxistin dikin. Digel kêmayiyan dîsa ya ku li hemberî nexweşiyên kapîtalîzmê dixweze xwe biparêze ev renge . Ev tişta ku em qalê dikin rastî ye.

Dema van tiştan dibêjim li çiyayên Kurdistanê gerîlayên azadiyê tên bîra min. Jiyana li derdora xwe ava kirîn bi benên pir qayîm hatiye honan. Ew benên qayîm rê nadin nexweşiyên kapîtalîzmê. Lewra têkoşîn kêlî bi kêlî didome. Nexweşî dema ku di ruh de valayî çêdibe derdikeve û xwe dide jiandin. Weke penceşêr ye. Yek hucre nikare tiştekî bike lê dema valayî çêdibe hucre xwe bi rêxistin dikin û mirov ber bi mirinê ve dibin. Pergalê wekî hişmendiya ruh û beden jî parçe kirine. Ji ber wê bi mezinkirina ruh di aliyê manewî de pir girîng e. Ew zarokên çiyayên azad di ruh de ewqas xwe kûr kirine ku bi vîneke bêhempa dijîn. Lewra ew jiyan bi armanca jin-jiyan û azadî hatiye honan.

Bi keda Rêber Apo azadiya jinê li Kurdistanê şênber bû. Dîroka azadiya jinê xwe li van ciyan dinivîse. Ew jinên çiyayên azad di wê zanebûnê de ne ku ew cî wan azad dikin. Dîsa dizanin ku li wan ciyan xwedawendan tovê jiyanê çandiye. Ji ber wê ya herî zêde li hemberî pargala dewletê têkoşîn dike jin e. Ev ji bo her qadê derbasdar e. Li qadên azad jin pêşengên şer û jiyanê ne. Her jina têkoşer, dişibe xwedewandên bihara ku aniye ser xaka Mezopotamya. Ma ne xwedewanda bihara rengîn jî rîwayet bû? Jin û jiyan li çiyan azadi dibin û pişt re jî şênber dibe; 'jin jiyan azadî'



# Filmek bi 10 zimanan

**Li Awustruralya filmekê ji bo ku serhatiya koçberiya piştî şer û avakirina civaka pirreng nîşan bide, projeyek da ber xwe.**

Li Awustruralyayê filmekê ji bo ku serhatiya koçberiya piştî şer û avakirina civaka pirreng nîşan bide, projeyek da ber xwe. Behsa 8 serhatiyan dike û ji bo vê tîmeke ji 8 nivîskar, 5 derhêner û deh zimanan, li ser film xebitiye. Di nava zimanên wê de Kurdî jî bi du zaravayên xwe heye: Kurmancî û Soranî. Navê filmê Here Out West e. Film behsa serpêhatiyên wan mirovan dike ku li rojavayê Sydneyê dimînin. Her 8 serpêhatî jî piştî revandina pitikekê ji nexweşxaneyeke Sydneyê bi rengekî ji rengan digihin hev. Dîmenên filmê jî li taxeke keviya bajêr a li Black town hatine girtin. Film vê mehê wê li sînemayên Awusturalyayê bê nîşandan. Film wê piştî ne bi gelekî jî di kanala televîzyonê abc de were nîşanda.

Navê Filmê: Here Out West

Derhênerên filmê: Fadia Abboud, Lucy Gaffy, Julie Kalceff, Ana Kokkinos, Leah Purcell

Dirêjahiya filmê: 101 deqîqe

***Ozgûr Polîtîka***



# Şanogeran jî got PKK'ê ji lîsteyê derxin

Kampanya ji bo PKK´ê bi pêşengiya hezar rewşenbîr, akademîsyen, siyasetvan, zanyar, hunermend û aktîvîstên sosyalîst hatibû destpêkirin, dewam dike. Şanogerên navçeya Çemçemal a ser Silêmaniyê, piştgirî dan kampanya ji bo derxistina PKK'ê ji 'lîsteya terorê' û gotin, li Rojhilata Navî PKK yenake partî ye ku piştî girtina rêberê wê, rêbaza wî weke dibistanekê dewam dike û rola PKK'ê ya li heremê jî bilind dinirxînin.

Kampanya ji bo PKK´ê bi pêşengiya hezar rewşenbîr, akademîsyen, siyasetvan, zanyar, hunermend û aktîvîstên sosyalîst hatibû destpêkirin, dewam dike. Heman kampanya roja 29'ê Çile bi tevlibûna gelek rewşenbîr, kesayet, pêşmergeyên dêrin û siyasetvanan li seranserê Başûrê Kurdistanê jî dest pê kir. Ev kampanya li tevahiya bajar û navçeyên Başûrê Kurdistanê wê belav bibe.

Şanoger Helwêst Nerîman diyar kir ku derxistina PKK'ê ji 'lîsteya terorê' girîng e û got, "PKK'ê li her çar parçeyên Kurdistanê xema neteweyekê hilgirtiye. Xema berîk û wezîfeyan hilnegirtiye. Lewma divê PKK ji 'lîsteya terorê' were derxistin. Rêber Apo yekane rêber e ku di girtîgehê de be û rêbaza wî dîsa jî dewam dike."

**Rêbaza Ocalan dibistanek e**

Şanoger Helwêst Nerîman got, divê li Rojhilata Navîn rêbaza Rêber Ocalan weke dibistanekê were temaşekirin: "Divê em jî weke hunermend bi rêya sînema û şanoyê neteweya Kurd mezintir nîşan bidin. Li gel bîr û felsefeya Ocalan a li ser aştiyê, nîşanî cîhanê bikin. Îsbat bikin ku cihê wî negirtîgeh e. Divê vî rêberî navendek mezin a lêkonîna li ser aştiya Rojhilata Navîn hebe û tez û fikrên wî pêk bîne."

Şanoger Mihemed Salih jî got, "Kampanya komkirina îmzeyan a ji bo derxistina PKK'ê ji 'lîsteya terorê' bi taybetî girîng e. Bêyî cudahiya îdeolojî û bîrûrayê, divê li her çar parçeyên Kurdistanê helwêsta me hebe. Nabe rêberekî mezin ê weke Abdullah Ocalan di girtîgehê de be. Niha divê ji her demê zêdetir em yekdeng û yekhelwêst bin da ku em mafên xwe bi dest bixin û bibin dewleteke serbixwe."

***ROJNEW***




# Ji bo zarok û mamosteyan alîkariya pirtûkan




**Hevseroka PEN`a Kurdî, Eslîxan Yildirim, ji bo zarokên ku wê dersa Kurdî li dibistanan li bakurê Kurdistanê û Tirkiyê hilbijêrin, pirtûkên Kurdî şandin.**

Hevseroka PENa Kurd û di heman demê de xwediya Weşanxaneya Azad, Eslîxan Yildirim ji bo zarokên ku wê dersa bijarte ya Kurdî hilbijêrin û ji bo mamosteyan pirtûkên bi navê Fêrbûna Kurdî, Herdemciwanê û Hezar û Yek Şev şandin Amedê, Batmanê û Mêrdînê.

Fêrbûna Kurdî-Pêngava Yekem ji aliyê nivîskarê 21 pirtûkên hîndekariyê Hesen Huseyin Deniz ve hatiye nivîsandin û amadekirin. Ev kitêb ji bo perwerdeya kesên ku nû dest bi xwendina Kurdî-Kurmancî dikin hatiye amadekirin. Herdu kitêbê din, Herdemciwanê (Eslîxan Yildirim) û Hezar û Yek Şev (Wergera ji Erebî-Menaf Osman) çîrokên gelerî ne. Mamosteyên Kurdî wek materyalên alîkar dikarin wan bi kar bînin. Ev pirtûk wê li hinek sazî û zarokan bên belavkirin.

Ji ber ku kitêb wê têra her kesî nekin, di heman demê de Weşanxaneya Azad li ser malpera xwe, tevî hin pirtûkên din, ev pirtûk jî wek PDF weşandin. Kesên dixwazin dikarin ji ser malpera https://wesanxaneyaazad.net/ xwe bigihînin wan.

***Ozgûr Polîtîka***

# NÇM ji gotina bi kurdî nayê xwarê

**Hunermendên NÇM'ê, nerezabûn nîşanî astengkirina mûzîka Kurdî dan û gotin, emê heta dawiyê bi zimanê xwe hunerê xwe bikin.**

Di 29'ê Çile de li Kolana Îstîklalê ya Taksîma Stenbolê, polêsên Tirk êrişî stranbêjên Kurd kiribûn û destgîr kiribûn. Piştî ku dîmenên dema êrişê û astengkirina polêsan li ser medyaya dîjîtal hatin parvekirin, gelek kesan nerazîbûn nîşan da û bi çalakiyên cûr bi cûr piştgiriya stranbêjên Kurd kir. Hunermendên Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) jî nerazîbûna xwe nîşanî astengkirina gotina stranên Kurdî da.

Hunermende NÇM'ê Talat Yeşîl got, ev sed sal in êrişî stranên Kurdî dikin û got, "Ev polîtîka bi destê dewletê gelek caran bi cureyên cuda hatiye meşandin. Îro jî ev polîtîqa dewam dike. Li her warî gelê me bi êrişên bi vî rengî re rû bi rû dimîne. Pirraniya êrişan jî li kesên ku xebatên ziman û çandê dikin, tên kirin. Doh pirtûk, sînema û rojnameyên Kurdî qedexe dikirin îro jî stranên Kurdî qedexe dikin. Divê hunermendên Kurd li dijî van êrişan bêdeng nemînin û nerazîbûneke mezin nîşan bidin. Em ê li her kuçe û kolanê stranên xwe bibêjin. Em vê neyartiyê şermezar dikin."

Organîzatora NÇM'ê Dîlan Sûyû jî got, êrişa li Îstîklalê ya li dijî cîwanên Kurd li dijî çand, huner û zimanê Kurdî ye: "Li Îstîklalê bi her zimanî stran tên gotin. Lê dema ku Kurdî be tê astengkirin. Esasê vê xweranegirtina li zimane Kurdî ye. Lê divê gelê me her tim li dijî êrişan bi ziman û çanda xwe bijî."

***MA***




# Mûzîka kurdî xwe kerr nake

**Stranbêjên ciwan yên Bakurê Kurdistanê, nerazîbûna xwe nîşanî astengkirina mûzîka kurdî dan û gotin, bi astengkirinan wê nikaribin zimanê kurdî û dengê mûzîka kurdî bibirin.**

Stranbêjên ciwan yên bakurê Kurdistanê, nerazîbûna xwe nîşanî astengkirina mûzîka kurdî da û gotin, bi astengkirinan wê nikaribin zimanê kurdî û dengê mûzîka Kurdî bibirrin."

**Li her derî Kurdî**

Li Kolana Istiklalê ya Beyoglû ya Stenbolê polêsên Tirk nehiştibûn mûzîkjenên kuçeyan bi Kurdî bistirînin. Piştî ku dîmenên vê astengkirinê li ser medyaya dîjîtal belav bûbûn, gelek kesan nerazîbûn nîşan da.

Li Amedê xebatkarên Akademiya Ma Musicê jî nerazîbûn nîşanî astengkirina muzîka Kurdî dan.


**Li dijî zordariyê timî têkoşîn**

Perwerdekarê akademiyê Xebat Yîgît got, zext û zora li ser ziman û çanda Kurdî bi salan e didome: "Muzîka Kurdî careke din hat astengkirin. Paşê wekî asteng nekiribin, daxuyanî dan. Ev daxuyanî ne jidil in. Em muzîkjenên Kurd, em ê nehêlin zimanê me winda bibe. Stranên me wê neqedin. Em ê tim binivîsin, bibêjin."

Muzîkjen Evîndar Dulek jî got, "Dewleta Tirk êdî di her warî de hewl dide dengê Kurdan bitepisne. Em jî li ber vê radibin. Tu divê, bila li seranserê cîhanê muzîka Kurdî û zimanê Kurdî qedexe bikin. Lê ew ê nikaribin di jiyana mirovan de qedexe bikin. Ew ê nikaribin zimanê Kurdî û dengê muzîka Kurdî bitepisînin. Êriş çi dibin bila bibin, em ê li her derî zimanê xwe û stranên xwe biparêzin û bibêjin."

Muzîkjen Sarya Ertaş jî qedexekirina konserên bi boneya salvegera 30´î ya damezrandina Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) bi bîr xistin û got, "Wê demê jî destûr nedan. Ji ber ku Kurdî ye, mudaxeleyên bi vî rengî dikin. Bi qest û zanebûn dikin. Lê me wê çaxê jî nerazîbûn nîşan da, em niha jî nîşan didin. Her ku ev mudaxele zêde dibin, em bêtir dixebitin. Ew çi qasî di tinekirinê de israr dikin bila bikin, em ê jî di hebûnê de bêhtir israr bikin. Em xebatkarên muzîka Kurdî, em ê tim têbikoşin."

***MA***



# Nûra, di binê balafirên keşfê de ji bo parastina zarokên xwe stargehek çêkir

**Nûra Şêxmûs Ehmed ya ji gundê Bab El-Xêr ya Til Temir di binê firîna balafirên dewleta tirkî ya dagîrker de ji bo parastina zarokên xwe stargehek çêkir.**

Nûra Şêxmûs Ehmed diyar kir ku ketiye sala sisiyan ku di vê rewşê de dijîn û wiha dom kir: "Sê sal in em bi êrîş û topbarana dagirkerên tirk û çeteyên wan re rû bi rû dimînin, bêtirî topên ku tên gundê me û gundê Eboş, ji Barageha Inêg El-Hewa a dagirkerên tirk ku tenê bi çend km rojavayî me dikeve, tên. Êrîş herî zêde sivîlan hedef digre, gelek mal û milkên sivîlan jî hatine hilweşandin û zirarên mezin dîtine. Dîsa berî çend rojan gundê me û derdorê dan ber topan, sivîl dîsa ber bi çolê ve çûn û wê şevê di nava zeviyan de di bin wê baranê û seqemê zivistanê de razan. Gelek caran dema topbaran dest pê dike û dirêj dibe, em nikarin gava xwe bavêjin derveyî malê û herin Til Temirê ji bazarê zebzeyan bikirin. Ji ber wê jî me li hewşa mala xwe şîkayî çandine, wekî pîvaz, reşad, bexdûnis, pelê silkan û tilpik û gelek tiştên din. Ava şêrîn di gund re derbas nabe, ji ber wê em bi ava şor baxçeyên xwe avdidin. Ji dema ku dagirker nêz bûne pirsgirêkên me yên kehrebê û avê çareser nebûye. Sê caran saziya enerjî û eliktirîkê hatin kehrebe çêkirin lê ev saleke em bê ronî ne û şevên me tarî ne. Dagirker eliktirîkê jî hedef digrin."

**"Di bin topbaranê de me binerd kola"**

Nûra Şêxmûs Ehmed da zanîn ku wan rêbazekî parastinê ku xwe ji topên dagirkeran avakirine û wiha pêl da gotina xwe: "Êdî mayina li çolan û razana di bin baranê de û di havînê de di wê germê de nedibû. Da ku em rêbazekî nû avabikin û xwe nespêrin derketina ji derve binerdek kolandiye. Binerd ji mangeyeke dirêjbûna wê 3 mitro bi pehinbûna 2 mitroyan pêk tê. Dîwarê hundir jî bi axê hatiye seyandin. Çêkirina wê heftiyekê dirêj kir, ku me û karkeran bi bêr û qazmeyan binerd koland. Hêjayî bibîrxistinê ye ku di bin firîna balafirên keşfê de û topbarana gundewaran de binerd hat kolandin, ruxmî xeteriya wê jî me domand û bi dawî kir."

**"Rêbazên nû yên parastinê li herêmê pêş dikevin"**

Nûra Şêxmûs Ehmed da xuya kirin ku ev rêbazê ku li herêmê nû pêşketiye êdî li gundên din jî belav dibe û wiha pêde çû: "Piştî ku mala me dest pê kir, êdî gundên derdora me jî dest bi çêkirina binerd kirin. Ji ber ku rêjîma Sûrî jî zirarê dide malên sivîlan, sivîl dest bi kolandina binerdan kiriye, da ku li malên xwe bimînin û xwe ji topbarana dijmin jî diparêzin. Wekî kurdên ku di vê xetê de jiyan dikin, me yekemîn car dest bi çêkirina binerd kir. Paşê li gundên din bi taybetî malbatên me yên ereb jî destpêkirin û roj bi roj pêşdikeve. Binerd wekî dîwarekî ye ku em xwe bispêrin wê. Gelek caran dema ku topbaran çêdibe em têde xwarinê dixwin û radizên."

Nûra Şêxmûs Ehmed balkişand ser rola hêzên garantor Rûsiya û Emerîka li herêmê û ev tişt anî ziman: "Hêzên Rûsiya û Eemrîka bi erkê xwe ve ranabin, ji ber dema topbaran çêdibe dagirkeran ranawestînin. Her wiha piştî topbaran jî diqede û sivîl ziraran dibînin, her dû hêz jî qaşo garantor in nayên û rewşa sivîlan nanhêrin û napirsên gelo tiştek ji wan hatiye ya na. Lê baweriya me bi wan nayê, em pişta xwe bixwe û şervanên xwe xurt dikin, ji ber hêza ku wê me biparêze şervanên me ne. Şervan bi me û em jî bi şervanên xwe xurt dibin."



**"Xwestin koka me biqelînin, lê ji bîr kirin ku em tov in"**

Nûra Şêxmûs Ehmed armanca dagirkeran bibîr xist û girîngiya hebûna xwe bilêv kir: "Bi topbaran û şerê taybet dijminên me xwestin em gundên xwe vala bikin, lê ne top û ne jî balafirên wan me tirsandin. Xwestin koka me hilînin, lê çete û dagirkerên tirk ji bîrkirin ku em tov in û li her derê şîn tên. Em ji vê derê ne û em ê li vir bin. Çi hêz were wê nikaribe me ji axa dapîr û bapîrê me derînin. Heya niha bîranînên dapîr û bapîrên me di her qoncikek gund de ne, ji bo vê yekê jî çiqase êrîş pêk werin em ê vê axê biparêzin. Çi bibe em amade ne ku heya dawiyê jî li ser vê axê birûmetî bijîn. Ger qesran ji mere werin lêkirin, em ê ji vir dernekevin."

**"Binerdan çêkin"**

Nûra Şêxmûs Ehmed bi vê gotinê dawî li axaftina xwe anî: "Em gelekî şoreşger in, li gorî şoreşgertiya xwe xwe birêxistin dikin. Em amade ne li vir bimînin, heya roja xwe ya dawî. Yan em jiyaneke azad an jî mirineke birûmet bimrin. Bila em li vir birûmetî bimrin, baştire ku li ser sînorê welatan perîşan bibin. Em wekî sivîl hêzê ji hebûna hevdû digrin. Divê ku sivîlên li seranserî xeta agir ji Til Temirê heya Eyn Îsa, Kobanê û bajarên din, binerdan ava bikin û zarokên xwe biparêzin. Ew çareya herî baş e."

***JINHA***

# Rêveberiya Sewalkariyê barê sewalvanan sivik dike

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ji bo çareserkirina pirsgirêka sewalvanan, herwiha peydekirina êm ji sewalan re, Rêveberiya Sewalkariyê ya Kantona Qamişlo madeya Nexalê li Sewalvanan belav dike.

Di van salên dawî de rewşa hewayê li seranserê dinyayê hatiye guhertin. Çimkî baran kêm e û ne di dema xwe de dibare. Ji ber wê bandoreke neyînî li çandinî û sewilkariyê hatiye kirin. Îsal jî baran li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kêm e. Ev jî ziyanê ne li çotkaran tenê li sewalvanan jî dike. Li kêleka vê pirsgirêkê jî bihayê êmê sewalan pir bilind e, kesên ku sewalên wan hene êdî nikarin êm ji sewalên xwe re bikirin.



Projeya belavkirina êmê sewalan her sal ji aliyê Rêveberiya Sewalkariyê ve pêk tê. Ev proje barê madî li ser milê xwediyên sewalan sivik dike. Lewra şêniyên Herêma Cizîrê bi taybetî yên gundan piraniya wan sewalan xwedî dikin. Herwiha çavkaniya wan ya sereke xwedîkirina sewalan e.



Derbarê mijarê de rêveberê beşa sewalkariyê Mihemed Kazim Hisên da zanîn ku ji destpêka salê ve dest bi belavkirina êmê sewalan kirine û axaftina xwe wiha domand: "Salên ku baran zêde dibariya şînatî çêdibû û welatiyan sewalên xwe diçêrandin. Ji ber wê berhemên sewalan yên weke penîr, mast, şîr û her wekî din hebûn. Lê îsal baran zêde nebariya û rewşa kesên ku sewalan xwedî dikin pir zehmet bûye. Ji bo wê me xwest ku alîkariya sewalvanan bikin. Me êm li kantona Qamişlo û Hesekê belav kir. Lê hê belavkirin bi dawî nebûye. Gropa me ya belavkirinê ji 15 komîteyan pêk tê. Destpêkê me li her bajarî jimara sewalan diyar dikir, da ku li gorî hejmara sewlan êm were belavkirin. Em ji bo her pezê 10 kîlo û çêlek, hesp, deve û gamêş her 50 kîlo nexalê didin. Bihayê her kîloyî li deverên din zêdeyî 800 lîreyên Sûrî ye, lê em bi 450 lîreyî didin. Ji ber ku derfetên me kêm in em her şeş mehan çarek êm belav dikin. Êmê ku em didin jî berhemê aşê me ye."

Mihemed Kazim bîr xist ku gelek cudayî di navbera belavkirina par û îsal de heye û gor, lewra îsal jimara sewalan kêmtir e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Sala çûyî me 5 hezar ton êm zêde belav kirin. Çimkî di jimara sewlên par de pir xapandin hebû. Gelek kesên ku sewalên xwe firotibûn jî êm digirtin. Gelek jê jî bi du navan bûn. Lê îsal me bi baldarî rewşa sewalan şopand û pişt re dest bi belavkirinê kir. Jimara par mezin bû û êm têra tevan nedikir. Par me nêzî 20 hezar tonî êm belav kir. Îsal em dikarin bi 15 hezar tonî belavkirinê bi dawî bikin. Bajarê herî zêde sewal lê hene Til Hemîs, Til Koçer, hol û Til Birak in."

Rêveberê beşa sewaldariyê Mihemed Kazim Hisên di dawiya axaftina xwe de got, hê belavkirin li hin bajaran bi dawî nebûye û ev li axaftina xwe zêde kir: "Heta niha me belavkirin li Til Hemîs, Til Koçer û li Til Birak bi dawî kiriye. Bajarê ku hê belavkirin lê bi dawî nebûye jî Amûdê, Qamişlo, Tirbespiyê, Çilaxa, Girkê Legê û Dêrîk e."

# Ne çand hiştin ne jî Sûr

**Bajar, ji cihekî fizîkî wêdetir taybetmendiyên civaka tê de didin der. Li gorî rewşa çandî û civakî teşe digire û bi gotineke din rengê civakê nîşan didin.**

Ji ber vê bajar û civaka ku di wan de dijîn weke parçeyên ji hev nayên cihêkirin tên dîtin. Navçeya Sûrê ya Amedê ya ku ji mêj ve nasname û baweriyên cuda bi hev re lê diman jî bi van taybetmendiyên xwe yek ji van bajaran e. Lê navçeya Sûrê ku bîra wê heye, hem ji ber hilweşandina bi qedexeyan re dest pê kir hem jî bi avakirina malên ku dişibin girtîgehê, van taybetmendiyên xwe yek bi yek ji dest dide.

Me dîmenên deverên qedexekirî yên taxên Sûrê yên ku ev 6 sal in ji gel tên "veşartin", girtin.

**Malên dişibin girtîgehan çêkirin**

Li Sûra di Lîsteya Mîrateya Çandê ya Dinyayê ya Rêxistina Çand, Zanîst û Perwerdeyê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO) de di 6 û 13'ê Îlonê, 10´ê Cotmehê û 28'ê Mijdara 2015'an de 4 caran qedexeya derketina derve hatibû ragihandin. Di 2'ê Kanûna heman salê de li taxên Cevat Paşa, Dabanoglû, Fatîhpaşa, Hasirli, Savaş û Cemal Yilmazê qedexe hatibûn ragihandin. Ev qedexe bû qedexeya herî dirêj a dinyayê. Li gorî raporeke Yekîtiya Odeyên Avahîsaz û Endezyarên Tirk (TMMOB), ji sedî 72'yê her şeş taxan piştî qedexeyan hatiye hilweşandin. Wekî din mizgeft, dêr, dibistan, hemam jî di nav de 334'ê wan tomarkirî, bi giştî 3 hezar û 569 avahî hatin hilweşandin. Li şûna van malan malên ku dişibin girtîgehên bi tîpên F û S hatine lêkirin. Ev mal bi kevirên bazalt ên bi makîneyê hatine birrîn û bi yek rengî li dijî avahîsaziya bajar hatine lêkirin. Demeke dirêj dora van malan bi bariyeran hat girtin. Beriya demekê, destûra ketina nava van malan hat dayîn


**Dîmenên nû yên ciyên qedexe**

Herî dawî qeyûmê Sûrê, Abdûllah Çîftçî Kanûna 2021'ê daxuyanî dabû û gotibû, ketin û derketine 6 taxan ne qedexe ye, tenê deverên şantiyeyan girtî ne. Deverên şantiyeyan jî taxên Cevat Paşa, Dabanoglû, Fatîhpaşa, Hasirli, Savaş û Cemal Yilmaz ku piştî qedexeyan herê zêde ew hatin hilweşandin.

Em çûn van deveran û me dîmenên wan girtin. Her çiqasî bê gotin ku qedexe ne jî ne xebatkarên şantinyeyan ne jî kesên ji resterasyonê berpirsyar, me asteng nakin ku em li nav avahiyên dîrokî bigerin. Belim jî ji ber ku me ji şantiyayê peywirdar dizanin, dengê xwe li me nakin.

Axir, min bi hevalê li cem xwe re wênegira xwe derxist û dîmenên avahiyên dîrokî yên 6 sal in ji herkesî tên veşartin û li ser piya mane, yek bi yek girtin. Li ser hin avahiyên dîrokî wêneyên mezin ên serokkomarê Tirk Erdogan, alaya Tirk û Mustafa Kemal hebûn. Ev wêne jî esas bajar ji bîra wî yekcar qut dikin.

***MA***





# Şefê DAIŞ'ê yê di binê parastina Tirkiyê de hat kuştin

**Piştî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên 1'ê Sibatê, şefê DAIŞ'ê Ebû Îbrahîm El Haşimî El Qureyşî li nêzî sînorê Tirkiyê di operasyoke hêzên taybet yên Amerîka de hat kuştin.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Serokê DYA Joe Bîden diyar kir ku li Etmê ya li herêma Idlîbê, hêzên taybet yên Amerîkan di operasyonekê de şefê DAIŞ'ê kuştine.

Li gorî Mala Çavdêriyê ya Mafên Mirovan ya Sûriyê di operasyonê de 13 kes hatine kuştin. Biden jî diyar kir ku tiştek bi leşkerên Amerîka yên di operasyonê de nehatiye.

DAIŞ'ê piştî kuştina Bexdadî bi awayekî fermî diyar kiribû ku şefê wan yê nû Ebû Îbrahîm El Haşîmî El Qureyşî ye.

Hejayî bîraninê ye ku şefê DAIŞ'ê yê berî El Qureyşî Ebûbekir El Bexdadî jî di Cotmeha 2019'an de li gundê Barisha ku ew jî girêdayî bajarê Idliba di bin dagirkeriya dewleta Tirk de ye, hatibû kuştin!

Tişta balkêş ew e ku piştî dewleta Tirk di 1'ê Sibatê de êrişî Şengal, Mexmûr û Rojava kir, DYE ev operasyon pêk anî. Gumanên gelo di kuştina şefê DAIŞ'ê de bazar û listokên Emerîka û Tirkiyê hene û dikîjan astê de ne, çêkirin. Lê ev gumane ne hatin zalal kirin.



# Şêniyên Hesekê 23 Şehîdên Oparasyona `Gurzê Gelan` spartin axê

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**4ê Sibatê saet 10:00`an bi hezaran şêniyên bajarê Hesekê cenazeyên 23 şehîdên operasyona `Gurzên Gelan` li goristana Şehîd Dijwar ya li gundê Dawidiyê spartin axê.**

Merasimê bi deqeyeke rêzgirtina li ser giyanê şehîdan dest pê kir. Pişt re Hêzên Sûriya Demokratîk merasimeke leşkerî li dar xistin. Di merasimê de Serokê Meclisa Leşkerî ya herêma Cizîrê Hisên Selmo, Hevseroka Desteya Rêveber ya PYDê Foza Yûsiv û Hevserokê Meslisa Pêkanînê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebid Hamid El-Mihbaş axivîn.

Hevseroka Desteya Rêveber ya PYDê Foza Yûsiv, di hizûra gelê di merasimê de ev pirs ji Nîçirvan Barzanî kir: Dema dewleta Tirkan ya dagîrker êrişî me dikir û zarokên me dikuştin, gelo te li Tirkiyê çi dikir!

Foza Yusiv jî teqez kir ku li hemberî xiyanet û êrişên dijwar yên plankirî, wê biratiya gelan û têkoşina azadiyê bi ser bikevin. Herwiha da xuyakirin ku hêza biratiya gelan ji hemû her hêzê xurttir e û got, ev hêz nahêle ku dagîrker armancên xwe pêk bînin.

Hamid El-Mihbaş jî da diyarkirin ku planên zindîkirina çeteyên DAIŞ'ê li bakur û rojhilatê Sûrî careke din têk çûn û da zanin ku ev bi saya fedakarî û têkoşîna şehidan pêk hatiye.

Piştî veşartina 23 şehidan, merasim bi sloganên; şehîd namirin, bimire xiyanet, bijî biratiya gelan, bijî Rêber Apo bi dawî bû.

Navên şehîdan wiha ne: Muhened Hesen Silêman, Ednan Ewde El-Ibêd, Mihemed Mihemed El-Ebid, Ehmed Hiwêdî El-Tawîl, Xelîl Mihemed Şêxo, Şikrî Wadî El-Deman, Ebdureûf Îd El-Selîm, Elî Hisên El-Elî, Ehmed Casim El-Elî, Îmad El-Salih, Reşad Ehmed Yûnis, Feysal Ebdulrehman, Ednan Ebas Xilêf, Egîd mihemed Xelîl, Ehmed Xazî Nasir, Ehmed Salih Silêman, Mihemed Fîras El-Dexîl, Samî Îbrahîm Yusif, Ebdullah Xelîl El-Efîn, Xalid Ilêwî, Zehrudîn Hesen Ebdo, Cuma Şêxo El-Bayrem û Ehmed Ayid El-Salih.



# KCDK-E: Divê li dijî van êrişan nerazîbûn di asta herî bilind de be

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**KCDK-E' da zanin ku divê bi çalekiyên bê navber bang li hêzên navneteweyî bê kirin ku bêdengiya xwe bi dawî bikin û bi erka xwe rabin. Herwiha diyar kir ku êrişên heyê li dijî mirovahiyê ne, divê ti gelên cîhanê yên demokrat vê yekê qebûl nakin.**

Kongreya Civakên Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) daxuyaniyek weşand û bal kişand ser girîngiya dewamkirina çalakiyên li dijî êrişkariya dewleta Tirk a dagîrker.

Di daxuyaniyê de işaret bi êrişên dewleta Tirk ên li ser Mexmûr, Şengal û Rojavayê Kurdistanê hate kirin û wiha hate gotin, "Bila raya giştî ya cîhanê û gelê me zanibin, faşîzma Tirk a mêtinger li her eniyê li hemberî têkoşîna azadiyê ya Kurd têk diçe. Ji aliyê leşkerî, dîplomatîk û aborî ve li her qadê di serdema xwe ya herî lawaz de ye. Bi rêya vê êrişê dixwaze aciziya xwe û krîza xwe ya kûr veşêre. Ev rastî li pêş çavan e. Dewleta Tirk ku pîvan û peymanên navneteweyî binpê dike, ji bêdengiya hêz û dewletên herêmî û navneteweyî werdigire."


Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku hem ji bo şermezarkirina êrişên dewleta Tirk a mêtinger, hem jî ji bo raya giştî ya navneteweyî bixin nava liv û tevgerê, gelê Kurdistanê yê li Ewropayê tevî dostên xwe du roj in li hemû welatan çalakiyan dike û hate gotin, "Ji bo teşhîrkirina vî sûcê li dijî mirovahiyê yê mêtingeriya Tirk a barbar û banga li hêzên cîhanî ku ji bo erka xwe bi cih bînin, divê berxwedan hîn bêhtir bê xurtkirin û dawiya hefteyê ev berxwedan bigihêje asta herî bilind. Ti cih divê xwe sist neke û nebêje ku me çalakiyên xwe kir û raweste. Gelê Kurdistanê û dostên wan ên enternasyonalîst, hêzên şoreşger û demokratîk divê berxwedana du rojan weke destpêkekê bibînin, çalakiyên hîn mezin û encamgir bikin û dawiya hefteyê bigihînin asta herî bilind."

# Polîsên dewleta faşîst rojnamevan Nurcan Yalçin destgîr kirin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Polîsên dewleta tirkî ya dagîrker di sibeha 4 sibatê de, li ser mala Rojnamevan Nurcan Yalçin de girtin û destgîr kirin.**

Li agahiyên di rojnameya Xwebûn de hatîn girtin, asayişa dewleta tirk ya dagîrker di sibeha 4 sibatê de, bi ser mala Rojnameger Nurcan Yalçin de girtin û ew binçav kirin e. Sedema binçavkirina Nurcan Yalçin nehat zanîn. Polîsan piştî Yalçin binçavkirin birine Şaxa TEM'ê ya Amedê. Hat diyar kirin ku der barê Nûrcan Yalçin de heta 24 saetan biryara qedexeya hevdîtina bi parêzeran re hatiye dayîn.




# Piştî rabûna gedexeya giştî rewşa Hesekê aram e

**Piştî rabûna qedexeya derketina derve û ragihandina QSD'ê ya kontrolkirina girtîgeha Sînaa, rewşa Hesekê aram e.**

Ji ber êrişên çeteyên DAIŞ'ê yên li ser girtîgeha Sînaa ya li taxa Xiwêranê ya Hesekê û ketina şaneyên çeteyên DAIŞ'ê di nava taxên Xiwêran û Zihûr de, Desteya Hundirîn a Rêveberiya Xweser qedexeya derketinê ya giştî ragihandibû. Duh qedexeya derketinê bi dawî bû û operasyonên lêgerînê li nav taxên bajêr berdewam dikin.

Desteya Hundirîn a Rêveberiya Xweser duh ragihand ku qedexeya giştî li ser kantona Hesekê bi dawî bûye û qedexeya qismî li seranserê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji saet 6'ê êvarê heta 6'ê sibehê dê dewam bike.



Piştî bidawîbûna qedexeya giştî, li Hesekê îro liv û tevgera welatiyan didome û êdî rewş aram e. Her wiha dikan, bazar û xwaringehan vekirî ne.

Li taxên Xeşman û El-Salihiyê jî operasyona lêgerînê berdewam in.

***ANHA***

# KCK: Dewletên li dijî DAIŞ’ê koalisyon ava kirîn, Rûsya û Iraq hevparên van êrişan in

**KCK’ê diyar kir ku dewletên li dijî DAIŞ’ê koalisyon ava kirîn, Rûsya û Iraq hevparên van êriş û kuştinan in û bang li gelên cîhanê kir ku li hemberî van kiryarên qirkirina gelan, bibin xwedîhelwest.**

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê têkildarî êrîşên hemwext ên dewleta Tirkam yên ser Rojava, Şingal û Mexmûrê daxuyaniyeke nivîskî weşand. KCK’ê, sivîl û şervanên di encama êrîşê de şehîd bûyîn bîr anîn û ji kesên birîndar re şîfa xwest.

### Têkoşîna 4 parçeyên Kurdistanê şefên faşîzmê har û dîn kirin

KCK’ê ragihand ku têkoşîna gelê Kurd a li 4 parçeyên Kurdistanê û li derveyî welat, tifaqa faşîst a Erdogan-Bahçelî xiste asta têkçûnê û wiha pê de çû:“Tevî hemû êrîşan, gelê me li derveyî welat, bi taybetî li Bakurê Kurdistanê, Rojava, Başurê Kurdistanê, Şengal, Mexmûr û Ewropayê li dijî polîtîkaya şkandina îradeyê, berxwedaneke dîrokî nîşan da. Gelê Kurd li her derê li ser piyan e. Li aliyê din êrîşên li hemberî gerîla rastî berxwedaniyek fedayî hat û hetin şikandin. Dema ku Komîteya Navendî ya PKK’ê encamên van hemû rastiya berxwedanê aşkera kir û helwesta Kurdê azad wê ji niha û pê ve çawa be, diyar kir; Faşîzma AKP-MHP’ê hişê xwe winda kir û êrîşî Mexmûr, Şengal û Rojava kir. Cihê ku êrîş kiriye jî cihên ku sivîl lê dijîn e. Vê yekê armanc kirin ku gel bitirsînin û serî bi tewînin. Armanca êrîşa li ser Mexmûr, Şengal û Rojava ev e.“

### ‘PDK amûrê dewleta tirkî yê propagandayê ye.’

KCK’ê, di daxuyaniya xwe de anî ziman ku PDK dixwaze van êrîşan rewa bike û got: “PDK propaxandaya li gor daxaza dewleta Tirk dike û dibêje, ‘êrîş ne li dijî sivîlan pêk hatiye, li dijî hêzên leşkerî pêk hatiye’. PDK amûrê dewleta tirk yê propagandayê ye.“

‘Êrîşa li ser QSD’ê êrîşa li ser gel e’

Di berdewamiya daxuyaniyê de KCK’ê got ku taybetmendiya hevpar a Şengal, Mexmûr û Rojava berxwedana fedaî ya li hemberî êrîşên çeteyên DAIŞ’ê ye û di têkbirin û paşvebirina DAIŞ’ê de roleke bingehîn lîstin û got: “Di şerê li dijî DAIŞ’ê de, Rojava 12 hezar şehîdên xwe hene. Şengal bi sedan, Mexmûr bi dehan şehîd dane. Bê guman gerîlayên HPG û YJA STAR’ê di berxwedana gelê Rojava, Şengal û Mexmûrê ya li dijî DAIŞ’ê de li kêleka wan rawestiyan. Vê berxwedana gelê me bi hêzên xwe yên xweparastinê re rê li dagirkeriya çeteyên DAIŞ’ê ya li Başûrê Kurdistanê, Şengal û Rojava girt. Bi vê berxwedanê nehiştin Iraq, Sûriye û Rojhilata Navîn bikeve destê DAIŞ’ê. Nehiştin ku DAIŞ bibe bela serê hemû mirovahiyê. Hêzên xweparastinê yên li Rojava, Şengal û Mexmûrê gel bi xwe ye. Hêzên xweparastinê ji gel veqetandin, tişek şaş e. Êrîşa li ser hêzên xweparastinê, êrîşa li ser gel e. Êrîşa li ser QSD’ê êrîşa li ser gel e. Her hêza ku gelê xwe li hember her cûre êrişa diparêze, rewa ye.“

KCK’ê bibîrxist ku qada hewayî ya Rojava ya DYA û Rûsyayê ye, Şengal û Mexmûr di bin kontrola DYA’yê de ne. Herwiha bibîr xist ku Iraq jî weke dewleteke serwer ji vê qada hewayî berpirsyar e, li cihê hatiye bombebaran din ala Iraqê jî hatiye parçekirin.

### ‘Bêdengî wê wek mînaka herî zelal a bêexlaqiya siyasî bikeve dîrokê’

KCK’ê di daxuyaniya xwe de ev tişt got: “ Hêzên Koalîsyonê, bi taybetî DYA, destûrê dide balafirên şer ên Tirk ku hevkarê yekem ê DAIŞ’ê ye. Di êrîşên li dijî Rojava, Şengal û Mexmûrê de heta niha gelek komkujî hatine kirin. Bêdengî û helwest ne nîşandana DYA, Rûsya û hemû hêzên koalîsyonê hevkariya van êrîşan e. Hevkarê van komkujî û kuştin in. Ev helwest êdî tam bêexlaqiyeke siyasî ye. Di dema ku dewleta Tirk êrîşî gelê Rojava, Mexmûr û Şengalê yên ku li dijî DAIŞ’ê li ber xwe didin; Bêdengiya kesên ku dibêjin em li dijî DAIŞ’ê ne, wê weke mînaka herî zelal a bêexlaqiya siyasî bikeve dîrokê. Ji van hêzan dipirsin gelo hûn alîgirê yên ku li dijî DAIŞ‘ê şer dikin in, yan li gel DAIŞ‘ê û hevalbendên wê ne.“

### ‘Divê gelê cihanê van kiryarên dij mirovî qebûl neke û rabe ser piyan’

KCK’ê anî ziman ku divê tevahiya gelê cîhanê li dijî êrîşan bertekên xwe bînin ziman û rabin li ser piyan. “ Li hemberî vê rastiyê ne tenê gelê Kurd û dostên wan, hemû gelên cîhanê, kesên demokrat, rewşenbîr, hunermend û kesên xwedî wijdan û exlaq in, divê li dijî Tirkiyeyê û DYA, Rûsya, welatên Ewropa û Iraqê ku rê li ber van êrîşan vedike, bibin xwedî helwest û rabin li ser piyan. Helwesta pêşî li êrîşên dewleta Tirk bigire, divê li her derê were pêşxistin. Ger wiha nebe hêzên li pişt dewleta Tirk a faşîst, qirker, kolonyalîst wê xwe veşêrin û ev jî wê cesaretê bide êrîşên dewleta Tirk.



Ti êriş nikarin serê gelê kurd bitewînin û tekoşina wa lewaz bikin. Em weke Tevgera Azadiya Kurdistanê timî li gel, gelê xwe yê Rojava, Şengal û Mexmûrê ne. Em di têkoşîna wan ya azadiyê de serkeftinê dixwazin.“

# Bi pêşengiya jinê, Kurd û Erebên Hesekê parastina xwe ya rewa pêk tînin

**Serbest Etê/Hesekê**

**HPC`ê bi Kurd û Ereban li bajarê Hesekê teqez kir ku wê heta dawiyê li ser xeta şehîdan bin, parastina xwe ya rewa pêk bînin û rê nedin serkeftina êriş û planên dijimin.**

### Hevgirtina Kurd û Ereban êrişa DAIŞ`ê şkand

20ê Çileyê, çeteyên DAIŞ`ê êrişî girtîgeha Xiwêran ya Hesekê kirin. Bi vê êrişê xwestin çeteyên xwe yên girtî birevînin û li herêma bakur û rojhilatê Sûriyê tevlîheviyê derxin. Ev êriş wek komployeke mezin li ser Rêveberiya Xweser û gelên herêmê hat niraxandin. Lê bi saya 121 şehîdên Kurd û Ereb ev êriş hat şkandin. Bi dewamkirina êriş û komployên li ser gelan, Hêzên Parastina Civakê (HPC) bi Kurd û Erebên



bajêr vîna azad ya civakê nîşan dan, kolan û taxên xwe ji her êrişê diparêzin.

### Pêşengiya jinê di parastina rewa de

Endama Hêzên Parastina Civakê ya jinê (HPC) ya taxa Tela`a ya bajarê Hesekê Sureya Dawid, ku li taxa xwe tevî du jinan erkê xweparastinê pêk tîin ji me re axivî û got, ji destpêka şoreşê ve me hêza xwe ya civakê bi rêxistin kiriye. Ji 20`ê meha borî ve jî li hemberî şaneyên çeteyên DAIŞ`ê di serî de jin, pîr, kal, mêr û ciwanên bajêr, ji bo xweparastinê daketin qadan. Bila her kes bizane, şervanên QSD`ê ne tenê ne, gel li kêleka



wan e; ew parazavên me ne û em jî xwediyên wan in.

### Ji qadên berxwedanê yên Hesekê berxwedana Îmralî hat silavkirin

Sureya teqez kir ku wê wek jin ti carî rê nedin çeteyên DAIŞ`ê û dewleta tirkî ya dagîrker ku di êriş û planên xwe de bi ser bikeve û bi vê peyamê axaftina xwe qedand: “Divê civak hişyartir be. Herwisa em bang li tevayiya gelê xwe dikin ku her kes di vê berxwedanê de rola xwe bilîze. Em ji qadên berxwedanê yên Hesekê silavan ji bo Rêber Apo dişînin û berxwedana li Îmralî pîroz dikin, herwiha em hêza xwe ji wî digirin.

### ‘Emê ji bo parstinê têkoşîna xwe bênavber bidomînin’

Herwiha Endamê HPC`ê



yê taxa Ezîziyê Mesûd EL-Mixilf ku bixwe Ereb e, ji me re axivî û ev agahî da: “HPC bi xebata xwe teqez kir ku hêza bingehî ya civakê ye û di vê rewşa dawî de roleke sereke dilîze. Bi hevkariya saziyên leşkerî û şervanên xwe, me aramiya taxên xwe parast. Em bi hêzên ewlekariyê re hevkar bûn û kesên biguman û bixeter radestî saziyên têkildar kirin. Herwiha me koçberên ji ber DAIŞ`ê revîn ji taxa Xiwêran û Zihûr himbêz kirin û li mal û ciyên parastî bi cî kirin. Wek HPC em soz didin şervan û gelên xwe ku emê li ser piyan bimînin; destkeftiyên xwe biparêzin û têkoşîna xwe bidomînin.”



# Komploya 15ê Sibatê, bi tecrîd û êrişên qirkirinê didome

**Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Herêma Cizîrê, Komploya 15`ê Sibatê şermezar kir û diyar kir ku armanc û planên komploya navneteweyî hatine qelskirin, lêbelê bi tevayî nehatine pûçkirin û komplo dewam dike.**

**Jiyan Ebas-Qamişlo**

15`ê Sibata 1999`an bi Komployeke navneteweyî Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocalan radestî dewleta tirkî ya dagîrker kirin. Ev 23`ê sal in komploya navneteweyî ya li dijî hebûna gelê Kurd, bi tecrîdeke giran ku li dij mirovayiyê ye dewam dike û di şexsê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de, gelê Kurd ji her alî ve tê qirkirin.

### ‘Armanca wan tinekirina tevgera azadiyê bû, lê bi ser neketin’

Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Herêma Cizîrê Hisên Ubêd diyar kir ku armanca komploya 15’ê Sibata 1999’an, pêşîgirtina li têkoşîna azadiya gelê Kurd bû. Herwiha teqez kir ku tecrîda girankiri ya li ser Rêber Apo û êrişên dewleta tirkî yên qirkirina Kurdan dewama komploya 15’ê Sibatê (Komploya Navnetewî)



ye û axaftina xwe wiha domand: “Encama komployê tersî planên hêzên hegemon derket, nikarîn pêşiya fikrê Rêber Apo bigirin û têkoşîna azadiya gelên bindest xurttir bû. Dewletên dagîrker ev ji bo planên xwe yên li ser gelan wek metirsiyeke mezin dîtin. Ji ber wê dewleta tirkî ya dagîrker êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dike û dijbera şoreşa me ye.”
Ubêd herwiha diyar kir ku projeyên sîstema kapîtalîst û dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî civakên Rojhilata Navî heta roja îro didomin û ev nirxandin kir: “Rêjima Tirkiyê her bi xewn û xeyalên ku dewleta Osmanî ji nû ve ava bike dijî. Jixwe ev proje bi alîkariya hêzên hegemonîk tê plankirin. Ji bo wê, planên qirêj bi tinekirina civakan, herwiha xurtkirina nijadperstiyê li ser esasê yek al, yek dewlet û yek zimanî pêk tîne.”

### ‘Li dijî siyaseta dewletên komploger hevgirtîna gelên Rojhilata Navî pêwîst e’

Hisên Ubêd got, Rêber Ocalan rêberekî neteweyî ye û ji bo mirovayiyê û tevayiya civakan têdikoşe. Herwiha aştî û fikirê demokratîk li Rojhilata Navî belav dike da pirsgirêkên heyîn werin çareserkirin.
Hisên Ubêd bal kişand ser gel û civakên fikir û felsefeya Rêber Ocalan qebûl dikin û wiha dewam kir: “Tevayiya gelan li ser bingehê fikirê Ocalan têdikoşin. Lewra fikrekî neteweyî ye û li dijî paşverûtiyê ya hêzên desthilat ya bi sedê salan e”.
Hisên herwiha bang li gelê Rojhilata Navî kir ku li dijî siyaseta dewletên komploger hevgirtina xwe ava bikin û wiha domand: “Dewletên komploger bi tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan hewl didin azadiya civakan têk bibin.”

### ‘Êriş, tecrîd û polîtîkayên li dijî gelan, ji komploya navnetewyî ne qut in’

Hisên Ubêd bal kişand ser polîtîkayên qirêj yên dewleta tirkî û axaftina xwe wiha domand:” Projeyên qirêj yên dewleta tirkî û alîgirên wê bi mayîndebûna sîstema neteweya demokratîk hilweşin. Ji ber wê li Îmralî tecrîda li ser Rêber Apo her ku diçe girantir dikin. Herwiha ji 23’yê Nîsana 2021’ê ve artêşa tirkî bi çekên kîmyayî qadên gerîla topbaran dike. Di heman demê de bi erêkirina dewletên hegemon êrişî deskeftiyên gelên bakur û rojhilatê Sûriyê dike. Ev kiryar bi giştî ji komploya 15’ê Sibata 1999’an ya di şexsê Rêber Apo de li hemberî gelê Kurd hatî kirin ne qut in.”
Hisên Ubêd bi van gotinan axaftina xwe qedand: “Em dizanin ku polîtîkaya niha ya li ser gelê Kurd tê meşandin dewama komploya navneteweyî ya berî 23 salan e û armanca wê jî lewazkirina têkoşîna azadiyê û rakirina deskeftiyên Kurdan ji holê ye. Lê rojbiroj bi fikir û felsefeya Rêber Apo û bi hevgertina gelên bindest têkoşîna li dijî faşîzm û dagîrkeriyê xurttir dibe û ev têkoşîn wê dawiya faşîzmê û desthilatdariyê bîne.”

# Êşa xiyanetê ji êrişê girantir e

**Yûsif Kara: Beriya êrişa bi ser wargehê de, ceyrana wargehê hate qutkirin, PDK´ê rêya Hewlêrê vekir û bangên alîkariyê hatin kirin. Ev hemû bi pîlan bûn, hemû girêdayî êrişa bi ser wargehê de bûn, xwestin bi yek carê wargehê vala bikin.**

Balafirên şer ên dewleta Tirk a dagirker, pêr bi şev saet 22:00’an Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) bi dijwarî bombebaran kir.
Li gorî daxuyaniya Fermandariya Hêzên Parastina Cewherî ya Mexmûrê, di encama êrişa dewleta Tirk a dagirker de 2 endamên Hêzên Parastina Cewherî ya Mexmûrê şehîd bûne û bi dehan kes ji şêniyê wargehê jî birîndar bûne.
Hemwext balafirên şer ên dewleta dagirker Şengal û Derika Rojavayê Kurdistanê jî bombebaran kirin. Li Şengalê bombebaranê qederê 4 saet û nîvan dewam kir.

### Êrişa li dijî Mexmûrê

Li Mexmûrê bûyerên balkêş qewimîn. Beriya êrişê ceyrana(kerebe) wargehê hat qutkirin, PDK’ê rêya Hewlêrê vekir û bangên alîkariyê hatin kirin. Derbarê armanca êrişên dewleta Tirk ên li dijî wargeha Mexmûrê, beriya êrişê qutkirina ceyranê, vekirina rêya Hewlêrê, helwêsta PDK û Iraqê, û helwêsta gelê Mexmûrê de, Hevserokê Meclîsa Gel ya Wargeha Penaberan a Mexmûrê, Yûsif Kara ji rojnameya me re axivî.



### ‘Iraq jî di nav vî karî de heye’

Yûsif Kara destpêkê behsa êrişê kir û got, êriş bi balafirên şer pêk hatiye, li dijî 8 cihan êriş hatiye kirin û axiftina xwe wiha domand:“Qazanek (bombeyên yek tonî) neteqiyaye; bandoreke nerênî li ser zarokan çêbû. Ji ber ku dengekî gelekî bilind hebû. Ev ne cara yekê ye ku êriş dibe, pîlaneke giştî ye. Ji ber ku hemwext li Şengal, Dêrik û Mexmûrê dan, ji bo vê, ev projeyek e. Ax, şeref û kerameta welat e, lê îro Tirkiye tê, şeref û kerameta Iraqê binpê dike. Destê Iraqê di êrişê de heye û hevkar e. Li ser me Kurdan bazirganiyê dikin. Helwêsta Iraqê ya niha li hemberî wargehê, îsbata vê êrişê ye. Armanca wan têkdan û valakirina wargehê ye.”

### Gelo NY jî parçeyek ji êrişê ye?

Hevserok Yûsif Kara behsa hevdîtineke wan a bi midûrê giştî yê Iraqê yê Neteweyên Yekbûyî (NY) re kir û ev agahiyên girîng dan: “Beriya niha hevdîtineke me bi midûrê giştî yê NY´ê yê Iraqê re çêbû. Çend pirs ji me kirin. Ji me re gotin, ma hûnê heta kengî li Mexmûrê bimînin? Bê guman ev pirs di vê pêvajoyê de watedar e! bi vê êrişê, xwestin gel bitirsînin, panîkê çêkin û di encama vê tirsê de wargehê vala bikin.”

### PDK’ê yekser rê vekir

Hevserokê Meclîsa Gel a Mexmûrê Yûsif Kara behsa rola PDK’ê jî kir û got, “Piştî bi salan rêgiriyê, PDK’ê rêya Hewlêrê vekir. Ev yek jî hesab kirine. PDK di vir de xwedî roleke sereke ye, di nava biryara rabûna balafiran de ye. Hinek berpirsên wan gotin, em ji alîkariyê re amade ne. Ez vê, weke alîkariyeke mirovî nabînim, ew jî bi pîlan bû. Xwestin gel bixapinin û wargehê vala û wêran bikin.”

### Ceyran qutkirin

Xisûseke din a balkêş a ku Yûsif kara balê dibe ser, qutkirina kerebê ye: “Beriya êrişê bi kêliyekê, ceyrana wargehê hat qutkirin, ceyrana wargehê ji Herêma Kurdistanê tê. Piştî êrişê yekser careke din ceyran hat. Baş e, heger balafirê li têlekê yan jî trafoyekê daba, wê çawa ceyran piştî wê bi deqeyekê hatiba.”

### Rayedarên Iraqê tenê li sivîlan pirsî

Agahiyeke din a ku hevserokê



wargehê da me, li ser helwêsta piştî êrişê ya rayedarên Iraqê bû: “Li Mexmûrê fermandarên Iraqê telefonî me kirin, pirs kirin. Lê pirsên wan jî balkêş bûn. Digotin sivîl in yan na? Ew jî parvekirina rolê bû, ev jî îsbata vê pîlanê ye. Ji bo wan, heger ne sivîl bin, rewa ye. Em alîkariyekî bi wî rengî layiqê wargehê nabînin, hem ji pişt ve xencer dikin, hem jî dibêjin, ‘em dixwazin alîkariyê bidin’. Em ê li ser piyan bin, çalakiyên me wê dewam bikin, weke wargeh helwêsta me zelal e.”

### Dronên bi sîleh geriyan

Kara, wiha domand: “Heger Iraq ne hevkarê êrişan be, çima heta sibehê dronên bi sîleh geriya? Bi taybet Iraq û PDK´ê hevkarê sereke ne, heman peywendî û têkiliya wan heye. Li ser Şengalê çi senaryo heye, li ser Mexmûrê jî heman senaryo heye. Destê xiyanetê di van êrişan de heye, bi dijminê xwe re bûne yek û anîna balafiran bi ser zarokan de ne karekî exlaqî. Navê wê xiyanet e, êşa vê xiyanetê ji hevkariya Iraqê ya bi Tirkiyeyê re girantir e.”

### Peyama wargehê berxwedan e

Hevserokê Meclîsa Gel a Mexmûrê Yûisf Kara di dawiyê de behsa helwêsta şêniyên wargehê kir û bang jî li Kurdan kir da ku xwedî li berxwedana wargehê derkevin: “Em ê berxwedan, hêrs û kîna xwe zêde bikin, em ê li ber xayinan rabin. Em ê Mexmûrê bernedin û belav nekin, çidikin bila bikin em ê xwediyê vê helwêsta xwe ya zelal bin. Em ê girêdayî îradeya rêbertiya xwe bin.
Ez bang li Kurdên bi şeref hemûyan dikim, êdî em rabin ser xwe û ji van êrişan re bêjin, êdî bes e. Em bibin yek deng û helwêst. Divê em li bendê nemînin, bi çalakiyên xwe saziyên mafên mirovan hişyar bikin da ku bila bi berpirsyariyên xwe rabin.”
*Yenî Ozgûr Polîtîka*